

Sûriya... ji zayînê heta îro

Lêgerîna li sedemên neketina rejîmê

Navenda Firat ya Lêkolînan

Pêşgotin

Piştî şerê cîhanî yê yekem, û di encama hilweşîna dewleta Osmanî û destwerdana dewletên rojavayî de, ji bo dabeşandina bermahiyan, peymanê Sykes-Picotê hat îmzekirin û sînorên nû û çêkirî hatin xêzkirin, îcarê Sûriya jî yek ji wan dewletên ku di bin rûspartina Fransîzî de ma, heta ku Fransayê di encama şerê cîhanî yê duyem û bertekên gelêrî ji Sûriyayê vekîşîya û gelek hikûmet êdî bi ser vê dewletê ve çûn, her wiha rastî gelek darbeyan hat, heta ku "Partiya Ba`is" gihîştê desthilatdariyê.

Ev bêhtirî deh salan e, êdî Sûriya cihekî girîng di rojê navdewletî û herêmî de girtiye, çimkî sala 2011`an xaleke guherînê di dîroka wê de bû. Li Sûriyayê qeyraneke navxweyî ya zor hebû, her wiha di nava gelek fişarên derveyî û tecirîdeke navdewletî de dijiya, îcar di encamê de û hemwextî "Buhara Erebî" rewş li Sûriyayê teqîya.

Lê "Buhara" Sûriyayê ne mîna "buharên" Misir û Tûnisê bû, li Sûriyayê rewş veguherî şerekî navxweyî û destwerdanên herêmî û navdewetî, û bi vê yekê re, şer heta roja me ya niha dewam dike.

Di vê lêkolînê de em ê hin agahiyan di derbarê pêşveçûna dîroka Sûriyayê ji dema zayînê heta rûspartina Fransîzî, û heta bi guhertina rejîma heyî û desthilatdariya "Ba`is"ê û guhertinên di derbarê wê de bi par ve bikin.

Girîngiya vê lêkolînê ji wê yekê tê ku îro doza sûrî bala gelek lêkolêr û navendên lêkolînan kişandiye û gelek di derbarê wê de nivîsîne, êdî bûye girêkeke bêçare û meydanake heyfhiilandinê ya navxweyî, herêmî û navdewetî, lê ya ku hişt em vê lêkolînê encamê bidin ew bû ku me xwest em hindêkî di sedemên neketina rejîmê heta niha de bêhtir kûr bibin, tevî ku tecirîdeke navdewetî û gelek ceza li ser rejîmê hene, her wiha rewşa aborî ya jinavçûyî û destwerdanên derveyî, evê yekê hişt ku em

berê xwe bidin dîroka vê dewletê, xwezaya wê û sedemên neketina wê binasin.

Cihê jiyosiyasî

Cihê Sûriyayê yê jiyosiyasî gelekî girîng e û ya ku vê yekê zelal û piştrast dike, gotina ku dibêje: "Yê ku bakurê Sûriyayê di destê wî de be, tê wateya ku Şam bi dest xistiye, û yê ku Şam di destê wî de be, ew li dijî Misirê gefek e, û yê ku gefan li Misirê bixwe, ew gefan li tevaya herêmê dixwe".¹

Sûriya ji dewletên xwedî roleke girîng a di hevsengiya herêmî de ye, wekî çawa Patrick Seale di pirtûka xwe ya bi navê "El-Sîra`ela Sûriya (Şerê li ser Sûriyayê)" de dibêje: "Yê ku Rojhilata Navîn bi rê ve bibe divê Sûriyayê kontrol bike, ew jî ji ber cihê wê yê stratejîk, ku serpireştiya "dergehên" bakurî rojhilatî heta ber bi Misirê ve dike, her wiha rêya bejahî ya di navbera Îraq û Deriyaya Spî, û bakurê Girava Erebî û sînorên bakurî yên cîhana erebî... Sûriya weke navendeke çavdêriyê ya baş tê dîtîn, ku bi rêya wê, hemû siyasetên dewletên mezin li herêmê tên şopandin".²

Halê hazir, xaka Sûriyayê êdî bûye barçeyek ji projeyên berfirehkirina desthilatdarî yên dewletên herêmî, her wekî çawa Îran xaka Sûriyayê di projeya xwe ya bi navê "Kevana Şî`î" de, û Tirkiya di projeya xwe ya bi navê "Osmaniya Nû" de bi kar tînin.

Her wiha ji bo Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê jî mijar derbasdar e û êdî weke qadeke girîng ji xwe re dibîne, ew jî ji ber sînorên Sûriyayê yên rasterast bi Îsraîlê re, û ji ber ku Amerîka Sûriyayê weke parçeyekî ji projeya xwe ya bi navê "Rojhilata Navîn a Mezin" dibîne.

Dîroka Sûriyayê

¹ Welîd fikirî, El-Cerîma El-Osmaniya, weşanxaneya El-rewaq, R 161.

² Patrick Seale, El-Sîra`ela Sûriya, R 14.

Dîrok her encama mêzîna hêzê ya di navbera aliyan de ye, ne ku encama kompoyan e, li vir, zayîna Sûriyayê jî encama lihevkerinên di navbera alî û dabeşiya berjewndiyan de bû. Em ê hindekî derbasî qonaxên bibandor ên dîroka Sûriyayê bibin, weke peymanana Sykes-Picot, hikûmeta El-Feysel, rasipartina fransîzî, û darbeya Be`îsî.

Peymana Sykes-Picot

Peymana Sykes-Picot di sala 1916an de -bi dizî- di navbera Brîtanya û Fransayê de hat îmzekirin û di naveroka wê de rê ji bo fransiyan hat dayîn ku serweriya îdarî ya rasterast li ser Lubinana mezin û herêmên peravên Sûriyayê yên bi navê "Herêma Şîn" pêk bînin, her wekî wê, weke mafên ku ji bo Brîtanyayê li başûrê xaka El-Rafîdên hatî dayîn ku ew jî bi navê "Herêma Sor" tê nasîn, ev herêm ji Bexdayê heta parçeyekî piçûk û dorpêçkirî ji Heyfa û Akayê dirêj dike, li nik wê jî, ji mafê Brîtanyayê ye ku rêya tirênê di navbera hersê bajarên Filistîn û deverên pîroz de saz bike, bi vê yekê ew herêm dê di bin destê birêveberiyê navdewletî de be û di nava herêmeke qehweyî ku piştî şer çarenûsa bê destnîşankirin de bimîne".

Di nava xaka wan herêmên "Şîn", "Sor" û "Qehweyî" de, herdu aliyan li hev kir ku dewleteke erebî ya serbixwe yan jî konfederaliyek ji dewletên erebî bê nasîn û parastin, ev dewlet li jêr desthilatdariya serokekî ereb be û Şam, Heleb, Hema û herêma Mûsilê jî di nav de, tevî wê bibin... bi vê yekê hem Brîtanya û hem Fransa –di çarçoveya hegemoniya xwe de- ji mafê wan e ku şêwirmend an karmendên biyanî ji wî hakimî re destnîşan bikin, lê li ser daxwaza dewleta erebî yan konfederaliya dewletên erebî".³

Eger em vegerin meylên wê demê vekolin, em dê bibînin ku siyaseta wê demê, ne xwedî meylê netewî, lê belê yê demokratîk û nenavediyetê bû û daxwaza sereke ya çandên herêmê bû. Di sala 1913`an de hejmarek ji rewşenbîr û siyasatmedarên ereb li hola Komeleya Erdnîgarî ya fransîzî li

³ Carl E. Mayer Shareen Blair Brizak, Sîna`et el-milûk, çapxaneya El-sitûr el-cedîda, çapa yekê, 2010, R140

Saint Germain, li Parîsê civiyan û daxwaza wan a herî girîng; vegera hukimê nenavendî yê osmanî bû.⁴

Piştî şerê cîhanî yê yekem sala 1918`an, dewletên osmanî ketin destê dewletên hevpeyman de û di encamê de, dewletine ku berê tune bûn bi navên cuda hatin avakirin, ew jî da ku herêmên desthilatdar ên nû bîn avakirin, di vê derbarê de birêz Ebdullah Ocalan dibêje: "Li şûna bicihkirina aştîya osmanî, evê peymanê (Sykes-Picot) berê Rojhilata Navîn da aloziyeke mezin û rêyeke tarî û xetimî. Lê dewletên neteweyî yê ku di dawiya şer de derketin, hemû jî mîna rejîmên komploger in, li hundir li dijî gelê xwe û li derve li dijî hev. Çimkî hilweşandina civaka kevneşop hat wateya ragihandina şerê li dijî gel. Di wextekî de ku hemû nexşeyên bi mestereyê hatibûn xêzkirin, tenê armanca xwe gurkirina şerê di navbera dewletên pêşesaz de bû".⁵

Hikûmeta Feysel

Piştî ku mîr "Feysel Bin El Hisên" karîbû –Heleb jî di nav de- Sûriyayê bi piştgiriya Îngilîzan kontrol bike, wî yekem hikûmeta Erebi li Şamê bi navê "Hikûmeta Erebi ya El-Feyseliya" ava kir, ku fransî dê sala 1920`an⁶ ji holê rakin, ew jî piştî peymanê di navbera Îngilîz û Fransiyan de (Peymana Sykes-Picot).

Dema Feysel serweriya Sûriyayê dîkir, dît ku pirnetewiya li Sûriyayê hewcedarî pergaleke ne-navendî ji bo dewleta Sûrî ye, îcarê destûrek danî ku di encama wê de, Sûriya bû xwedî hukimekî xwecihî û dabeşî çend kantonan bû, û di heman salê de yekem destûr ji Sûriyayê re hat sazkirin, ev jî madeya duyem ji wî destûrî ye: "Memlekta Sûrî ji kantonan pêk tê, bi vê yekê yekîtiyeke siyasî ya ku dabeşiyê qebûl nake ava dibe". Di madeya 27`an de jî, li ser nenavendiya siyasî teqez dike: "Hikûmeta

⁴ "Rêya ber bi Sykes Picot ve û şerê cîhanî yê yekem bi nêrîneke erebî", Navenda Cezîrê ya lêkolînan, Dar El-erebî ya zanistan, 2016, R92.

⁵ Ebdullah Ocalan, Parêznameya pêncem, R544.

⁶ Rêya ber bi Sykes Picot ve û şerê cîhanî yê yekem bi nêrîneke erebî", Navenda Cezîrê ya lêkolînan, Dar El-erebî ya zanistan, 2016, R106.

giştî ya kantonên Sûriyayê ji Desteya Wezaretan pêk tê, û li pêşiya Encûmena parlamentoyê ya giştî berpirsa kiriyayên xwe ye".⁷

Ev hikûmeta "feyselî" demeke dirêj li ber xwe neda, û fransiyan destwerdan kir û hikûmeteke rasipartî ya nû li şûna ya kevin ava kir.

Rasipartina Fransizî

Piştî mêtîngeriya Fransiyan, li Sûriyaya îroyîn, çar dewlet hatin avakirin: Dewleta Şamê, dewleta Helebê, dewleta Durziyan, û Senceqa El-Îskenderonê (Liwa el-Iskenderun). Niştîmanperwerên Erebb ên sûtî dabeşkirina Sûriyayê li ser dewletên piçûk red kir, di heman demê de ramanên dijber li herêma Elewiyan, Cebel El-Durzî, û herêma Cezîra li bakur-rojhilat derketin, çimkî rêberên herêmî, xwedî ramanên herêmî bûn".⁸

Di sala 1925`an dewleta Sûriyayê hat avakirin û Heleb û Şam di nava xwe de dihawand, lê Çiyayê Elewiyan û Durziyan hukimê xwe yê serbixwe parast, her wekî Lîwa Îskenderon⁹, îcarê ev dewlet di nava çarçoveyê navendî de nehatin yekkirin, heta beriya fransî ji Sûriyayê vekîşyan.

Piştî bidestxistina "Azadên" Fransayê ji hukim re, bi Bloka Niştîmanî re ji bo biserxwebûna Sûriyayê li hev kir û rêkeftina 1936`an îmze kir û sala 1946`an ji Sûriyayê, di bin zexta bertekên cemawerî de, derketin.

Kurd û rasipartina Fransizî

Herêmên Kurdî jî, mîna hemû deverên Sûriyayê, di bin desthilata Osmaniyan de bûn, lê bi rengekî ne-navendî bi rê ve diçûn, û dema Fransî hatin, Kurdan jî weke hemû pêkhatayên din, daxwaza otonomiya xwecihî kirin ku bi rêya wê kar û barên xwe birêve bibin. Di dema ku Fransa di salên sihî yê sed sala borî de bi hikûmeta niştîmanî ya Şamê re peymanek îmze kiribû, navdarên êlên Cezîrê, , daxwazên xwe ji Fransayê

⁷ [دستور سوريا ١٩٢٠](#)

⁸ Nicholas Van Damme, jêdera borî, R65.

⁹ [التطور التاريخي للمركزية واللامركزية في سوريا](#)

re şandibûn, û xwestin ku roleke mezintir ji pêkhatayên herêmê re bê dayîn, da ku kar û barên xwe bi rê ve bibin. (xala herî girîng û divê em giraniyê bidinê ew ku Fransayê kurd di wê demê de weke kaxezeke serkeftî bi kar dianî, çî di têkiliyên xwe yê bi Tirkiyayê re, çî jî di dema xêzkirina sînorên Sûriyayê de, tevî ku zerer û neyînên wê ne di asta tiştî ku Îngilîzistanê li Îraqê kirî bû. Nêzîkatiyên Fransayê bi awayekî ezezî bûn û di parçekirina Kurdistanê de, di serdema nûjen, xwedî roleke pêşeng bû (Peymana Enqerayê 1921`ê).¹⁰

Em dikarin bi rêya raporta veşartî ya serokê Fransayê Alexandre Millerand ji Komîserê Bilind ê Fransayê re şandî, rewşa kurdan binasin. Di raporta bi dîroka 6 tebaxa 1920`an a bi navê "Plansaziya birêxistinkirina rasipartina fransîzî li Sûriyayê", Millerand formuleke alternatîf ji bo "padîşahiya neteweyî" bi çend dewletan re, ku ji welatên tirk û kurdan dest pê dike, pêşniyar dike, û dibêje: "Berî her tiştî, em nikarin erdên tirkî (Entab, Bîrjak û Kilîs) û erdên kurdî (rojhilatê Firatê bi Riha û Mêrdînê ve) ku ev herêm dikevin bakur û bakurê rojhilat û ti têkiliyeke wan a neteweyî bi Sûriyayê re tune ye, bi awayekî yekser tevî vê fedraliyê bikin. Lê kengî operasyonên leşkerî yê dijber ku ji aliyê netewperestên tirk ve encam didin, pêk hatin, wê demê welat dikar bo "rêberên xwecihî" bîn radestkirin, ji wan û bi awayekî taybet "Mihemed Beg", serokeşîrê Milî ku li (Verancheir) dimîne, her wiha gerek e xêzkirina sînoran bîn sererastkirin; da ku Êla Milî neyê dabeşkirin bû du beşan... Lihevkirineke bi vî rengî ya bi kurdan re û bicihkirina pêkhatayên keldanî û asûr li ser xeta trêne ya li rojhilatê Firatê, me li hember Kurdistanê dixê rewşeke siyasî ya nimûneyî... her di dawiyê de dibêje ku"piştî birêxistinkirina xaka tirkî û kurdî, dê Heleb û Terablus jî di dewrê de bin, ew jî li ser esasê formeke pêkanîna aramiya siyasî li herêma Entab û formeke destwerdana li herêma Rojhilatê Firatê bi awayekî hayedar, bi vî awayî, em dikarin biryar bidin ka gelo pêwîst e ev herêm bibin xwedî pergaleke serbixwe yan tevî yekîtiya sûrî bîn kirin. Lê halê hazir-çî dibe,

¹⁰ Ebdullah Ocalan, Manîfistoya Şaristaniya Demokratîk, çapa yekem, cilda pêncan, R276.

bliya bibe- gerek e cudahiyeke berçav di navbera van herê m û welatê Sûriyayê de bê danîn".¹¹

Lê, "hebûna Kurdan, heta Tirkmenên ku di nav sînorên dewleta ku dê paşê bi navê Komara Erebî ya Sûriyeyê bê ragihandin li ber çavan nehat standin, û mesele bi awayekî veşartî hat çareser kirin, û tenê li gorî hevsengiyên hêzên leşkerî û siyasî weke bûyerekê pêk hat.. ne tenê wisa, lê belê rewşa Ereban jî bi ti qanûnî nehat misoger kirin, û tenê li gorî berjewendiyên dewleta rasipartî (Fransa) hat şopandin... Ji destpêkê ve û ji rewşa xirab, aloz û serdest encamên xirab ên ku dê bî der diyar in".¹²

Diyardeya Darbeyan

Fransayê dev ji Sûriyayê berda, evê yekê hişt ku rêber û serok çavên xwe berdî desthilatdariya wê, ji ber ku Fransa Sûriyeye nebirêxistin kirî li pey xwe hişt, û di encamê de her ku darbeyek çêdibû, asoyên yeke din derdiketin holê, ev darbe jî bi temenê xwe yê kin dihatin nasîn, ku ev bi xwe jî nîşaneyê lawaziya dewleta nû ye.

Piştî derketina Fransayê, hakimên ereb ên pêşeng navedîbûn di hukim de bi cih kir, û evê yekê hişt ku li Sûriyayê 8 darbe encam bidin:

A yekem di adara 1949an de bi serkêşiya Husnî El-Zaîm bû, û ya duyem jî di tebaxa heman salê de pêk hat û di encamê wê de Samî El-Hinawî hukimê Husnî El-Zaîm hilweşand. Darbeya sêyem di kanûna 1951ê de bi serkêşiya Edîb Şîşekilî li dijî Haşim el-Atasî pêk hat, paşê jî darbeya çarem di sibata 1954an de, bi serkêşiya Mamûn el-Kuzbarî li dijî Edîb Şîşekilî encam da .

Darbeya pêncem di îlona 1961ê de bû, û ji aliyê Heyder el-Kuzbarî ve li dijî dewleta yekîtiya bi Misrê re, di serdema Cemal Abdul Nasir de bi rê ve çû.

Darbeya şeşan di adara 1963an de pêk hat, û ji aliyê Luay el-Atasî û "Partiya Ba`is"ê ve li dijî hikûmeta Nazim el-Qudsî bû, lê darbeya heftem di sibata 1966an de bi serkêşiya Selah Cedîd pêk hat û tê de hukimê

¹¹ Wecîh Kewseranî, Bîald el-Şam di Despêka Sedsala Bîstan de, Navenda Erebî ya Lêkolîn û Siyasetê, çapa sêyem / 2013, R 232.

¹² Ebdullah Ocalan, parêznameya pêncan, R 187.

Emîn Hafiz hat rûxandin. Darbeya dawîn di mijdara 1970`î de pêk hat, dema ku Hafiz el-Esed hukimê Selah Cedîd hilweşand, ku ew jî wekî "Hereket El-Teshîhiya" tê zanîn".¹³

Şerê xwecihî yê li ser desthilatdariyê û biserketina "El-Be`is"

Di ber bidestxistina desthilatdariyê de, Ba`siyan gelek pevketinên dijwar kirin û di encamê de darbe û hukim kirin destê xwe. Slogana herî girîng a tevgera Be`isê "Yekîtiya Erebî" bû, ji ber ku Be`isî li mekanîzmayekê digeriyan ku van ramanên nijadperest di bin sîwanek, yek al, yek padîşah, yek welat û yek artêşê de bi cih bînin, îcarê ev yek di dema yekîtiya Sûriya û Misirê de di navbera 1958 û 1961`ê de pêk hat.

Piştî jihevqutbûna ku di 28`ê îlona 1961`ê de çêbû, navê "Komara Erebî ya Yekbûyî" bû "Komara Sûrî", lê di cih de dîsa navê wê hat guhertin û bû "Komara Erebî ya Sûrî".

Piştî rêze-darbeyên leşkerî, Be`is -piştî ku di sala 1958 de hat hilweşandin- bi hêz vegeriya qada siyasî û leşkerî. Darbeya leşkerî ya Be`isê bi serkêşiya efser Selah Cedîd, Hafiz Esed û Mihemed Omran di 8ê Adara 1963an de pêk hat û jê re "Şoreşa Heştê Adarê" hat gotin. Bi hatina Ba`is li ser desthilatdariyê, hikûmeta nû ya Selah el-Bîtar rewşa awarte ragihand, ku ev weke dirêjtirîn rewşa awarte di dîrokê de tê dîtin; (ji 8ê adara 1963an heta 21ê nîsana 2011an dom kir)¹⁴.

Bi hukimê "Be`is" re, rêze-pevketin di navbera serkirdeyên "Be`is"ê bi xwe de li ser desthilatdariyê derketin, û bi xwe re tesfîyekirina di nava refên wan de anî. Di encama pevketina navxweyî de ku xwedî renekî nijadperest bû, darbeya leşkerî di sala 1966`an de li dijî serok Emîn Hafiz û efser Omran û hinekên din li jêr navê "Tevgera 23`ê Sibata" pêk hat û di encamê de, komên leşkerî yê bi serkirdayetiya efserên navdar ên Sunî hatin paqijkirin û Be`is di dîroka 23`ê sibata 1966`an de bû du beş, ew jî dema ku general Selah Cedîd û Hafiz Esed serkirdayetiya neteweyî ya li dora Mîşêl Efleq û Selah Bîtar, damezirînerê parityê di sala 1947`an

¹³ [الانقلابات العسكرية العربية.. البداية بين العراق وسوريا والمنتهى في السودان.](#)

¹⁴ [انقلاب ٨ آذار الذي مهد لسيطرة الأسد على سوريا.](#)

de, ji nav bir û hukimê serokê dewletê yê wê demê, Emîn Hafiz, hat hilweşandin û damezirînerên partiyê di navbera zindan û revînê de tar û mar bûn.

Piştî wê, efsêrên Durzî hatin tasfiyekirin, ji ber ku ew bêhêvî bûn, û nedikarîn cihên payebilind bi dest bixin, lewra hewldaneke têkçûyî ya darbeyê pêk anîn ku bû sedema kuştina Selîm Hatûm, û piştê efsêrên Houran hatin tasfiyekirin û ji erkên wan hatin bidûrxistin, ji ber ku wan nîgeraniya xwe ji zêdebûna bandora elewîyan di nav artêş û partiyê de anîn zimên. Mesele bi vê yekê ranewestiya, çimkî ev nakokî derbasî xelegeke teng bû û di navbera Hafiz Esed û Selah Cedîd de pevçûnê dest pê kir, ew jî ji ber nerînên cuda yê derbarê çawaniya birêvebirinê de bû. Piştî nakokiyên dirêj di navbera baskên leşkerî û siyasî di dewleta Sûriyayê de, nemaze piştî têkçûna şerê sala 1967`an bi Îsraîlê re, Hafiz El-Esed -ku xwediyê hêza leşkerî bû- li gel çend efsêrên Be`isî, di 16ê mijdara 1970ê de darbeyeke leşkerî li dijî efsêr Selah Cedîd û serokê wê demê yê Komarê Nûredîn el-Atasî pêk anî û ew xistin zindanê û darbe wek "Hereket El-Teshîhiyê" bi nav kir. Taliyê, Sûriya derbasî qonaxa dewleta Be`is a totalîter bû, ku ji aliyê -tenê- yek partiyê ve bi rê ve diçû, heta ku bû dewleteke malbatî û mezhebî.

Ekrem El-Horanî di bîranînên xwe de wiha dibêje: "Piştî têkçûna "Hezîranê", rejîma Sûriyayê li kiryariyên xwe ji şaşî û jirêderketinan vengeriya, lê belê berovajî vê yekê bû.. Tiştê ku li Sûriyayê qewimî, berfirehkirina hegemonya Hafiz Esed bû, fermandarê artêşê, fermandarê hêzên esmanî, wezîrê berevaniyê û endamê Femandariya Neteweyî, her wiha desthilatî û derfetên birêveberê îstixbaratan Ebdulkerîm El-Cundî jî piştî bibinketinê zêdetir bûn, gelek partiyên siyasî kirin zindanan û bi tawan pêkanîna darbeyekê li dijî rejîma hakim, ew êşence kirin". Li deverê din jî dibêje: " wî li şûna berevaniya di ber welat de, êdî artêş amade dikir li ser esasê berevaniya di ber rejîmê de. Gelek efsêrên sûrî yê pispor ji erka wan bi dûr xistin û li şûna wan efsêrên yedek yê hizbî û mamaoste û karmend bi cih kirin, nemaze piştî darbeya 8`ê Adarê".¹⁵

¹⁵ Ekrem El-horanî, Bîranîn, R3630.

Piştî çil salî ji desteserkirina Sûriyayê, êdî di encama xwepêşandanên "Bihara Ereban", Sûriya derbasî qonaxeke nû ya pevçûn û destwerdanên herêmî û navdewletî bû, heta ku bû qadeke heyfhandinê ya di navbera wan de.

Xwezaya Rejîma Sûrî

Rejîma Sûrî ya niha koka xwe ji darbeya Be`isî ya sala 1963`an û destûra 1973`an ku dikarîbûn rola serkêş a "Partiya Be`is" bi cih bînin, digire. Em dikarin hemû geşedanên ku li Sûriyayê, di dema hukimê "Partiya Be`is" de encam dane, wiha rêz bikin:

- Piştî ku Esedê bav hat ser hukim, desthilatdariyeke dubend ava kir, pareke mezin ji hikûmet û birêveberiya sivil da suniyan û para herî mezin da partîzanan, lê saziyên leşkerî yê çalak û serkirdeyên ewlekariyê û îstîxbaratî kirin destê elewîyan.¹⁶
- Rejîm bû hevalbenda partiyên biçûk, ji ber ku "Rejîma Sûrî ji bo mayîna li ser deshilatê hemû rêbaz bi kar anîn, û stratejiya girêdana hevbendiyên demkî bi armanca keysbaziya desthilatê, ji sala 1963an heta îro gelek caran hatiye dubarekirin. Her wiha di şerê Sûriyayê de jî ku sala 2011`an dest pê kir, belî bû, îcarê ji bo hakimên be`isî ne pirsgerêk bû ku hevalbendiyên bi parityên din re jî çêbikin, tevî ku ji milê îdolojîyê ve ne nêzî hev bûn jî, heta asta ku bi partîne di rastiya xwe de dijminê wan bûn, ev yek jî bi armanca mayîna di desthilatdariyê de û keyspazkirina wê."¹⁷
- Rejîm li ser werîsê kêmeteweyan jî lîst û ew wek kaxezeke fişarê bi kar anîn. Cengîz Candar di pirtûka xwe ya bi navê "Qîtar Rafîdîn" de, ku tê de cewhera rejîma Sûriyayê vedibêje, behsa wê yekê dike û dibêje: "Li Sûriyayê mirovê duyemîn tine ye, ne jî zîlamê sêyem, çarem, pêncem û şeşem. Em dikarin behsa çend kesan di rêza heftem de bikin. ev rejîm, rejîmeke hindikayî ye, şertê hebûna wê û berdewamiya wê, danîna peywendiyên bi kêmeteweyan re ye

¹⁶ [مسار الصعود العلوي: الأسد أعطى الحزب والإدارة للسنة \(٢-٢\)](#).

¹⁷ Nicholas Van Damme, Wêrankirina welatekî, Şerê Navxweyî li Sûriyayê, Jana Tamer ji bo Lêkolîn û Weşanê, çapa yekem, Beyrût, 2018, R 26

û wan weke "kaxezeke fişarê" bi kar tîne û xwe bi wan ve asê dike".¹⁸

- Hukimên urfî hatin bikaranîn û "dewleta sûrî bi ti rengî jî ji salên bîstan ve neketiye rewşeke asayî de û heta niha jî bi hukimên urfî desthilata xwe bi rê ve dibe û ti pergaleke wê ya destûrî ku xwe bispêre lihevhatina civakî tune ye".¹⁹ Di sala 2011`an de "Qanûna Ewarte" rakir, lê li şûna wê qanûneke jê xerabtir derxist, ew jî qanûna "Parastina ewlehiya niştîmanî" û parastina rûmeta welatiyan û antî-terorê, ji ber ku hebûna rejîmê bi hebûna rewşa ewarte ya ragihandî ve girêdayî ye.
- Tiştê herî girîng a ku Hafîz Esed kir ew bû ku sîstema siyasî ji sîstemeke ku di encama darbeyan de tarûmar bûbû, veguherand rejîmeke totalîter, ku tê hemû aliyên desthilatdariyê di destê serok de bin û di ber vê yekê de di rûyê her kesekê desthilatdariya wî qebûl nedikir sekinî, û derî li ber her rewşek pirrengiyê di her warekî de û li ber çî navgîneke ragihandinê ya dîtbarî, dengî û nivîskî, ku li gorî yek nêzîkbûnê dişopînin, girt. Partiya Be`is weke serokê dewlet û civakê dihate dîtin, ji ber ku digot "her kesê ku li Sûriyayê dijî Be`isî ye, lê ne birêxistinkirî ye."
- Rejîma sûrî, rejîmeke leşkerî ye, û heta niha jî pileya leşkerî dewletê bi rê ve dibe, û serokê Sûriyayê Beşar Esed eger pileya serbaz wernegirtibana ew ê nikarîbana li ser kursiyê hukim rûniştibana.
- Dîbêjin ku rejîma hukimdar li Sûriyayê komarî ye, lê di rasyayê de tiştekî wê û komariyê bi hev re tune ye, ji ber ku yek: rejîma komarî xwe dispêre hilbijartinan da ku valatiya di sazîyên dewletê de tijî bike, lê li vir, proseya hilbijartinan tenê şekilî ye û li gorî lîsteya veşartî bi rê ve diçe. Du: komar gerek e sivîlî be, lê îstîxbarat û leşker vê rejîmê bi rê ve dibin. Sê: Komar e, lê di veguhezitina desthilatdariyê de xwedî sîstemeke mîratgîrî ye. Çar: Komar e, lê ne li ser bingeha destûr û qanûnên sivîl bi rê ve diçe, çimkî li gor dahola hakim destûr tê guhertin, weke nimûne jî, sererastkirina

¹⁸ Cengîz Chandar, El-Rafidein Express, Mala Zanistî ya Ereban, çapa yekem, 2014, r. 63

¹⁹ Ebdullah Ocalan, Parêznameya pêncan, 2018, R 187.

destûr ji bo bi temenê serokê sûrî Beşar Esed re bigunce (34),
dema ku pêwîstî pê hebû.

Lê ji bo ku em baş xwezaya rejîmê binasin, gelek taybetmendî hene ku vê yekê şîrove dikin:

Lawaziya Saziyan

Ji taybetmendiyên vê rejîmê yên herî girîng ew ku saziyên lawaz ên li hember desthilatdariya ewlehiyê bêbiryar in ava kirin, ku ev desthilatdarî li gorî berjewendiyên xwe, wan saziyan diguherîne, her wiha hin parityên biçûk û lawaz dan dora xwe da ku bibêje hevkarî di desthilatdariyê de heye. "Xwesipartineke radîkal li ser serok û hevsengiya desthiltdariya ku bi zanebûnekê hat avakirin, çimkî hegemonî û giraniya siyasî û aborî ya tevaya gerînendeyan di hundirê rejîmê de li ser nêzîkbûna ji serok diman".²⁰

Aliyê Olî

Dema ku destûra 1973'an hat amadekirin, xala ku divê ola serokomar misilman be hat rakirin, lê belê ev guhertina destûrê li gelek herêman bû cihê nerazîbûna gel û hat redkirin. Ev jî bû sedema paşvekişandina wê guhertinê, û "paşê pirs hat kirin ku gelo rewa ye ku elewî bi navê misilman bin yan na? û ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê, Beşar Esed xwe avête hevalê xwe yê şîî Îmam Mûsa Sedir, serokê desteya bilind a şîîyan li Libnanê, û fetwayek derxist ku Elewî bi rastî mezhebekî misilmanên şîî ne, û bi vî awayî astengeke olî ji rêya serokatiya Esed hat rakirin".²¹

Piştî ku ola dewletê di destûr de hat bichkirin, êdî rejîm û "Îxwan El-Mislimîn" rûbirûyî hev bûn, îcarê şerê wan kir û ew bê bandor kirin û di encamê de ol bû mîna navgînekê di destê rejîmê de, di dema pêwîst de bi kar tîne.

Aliyê Ewlehiyê

²⁰ R 11. الداخلية السياسية تحديات 2): (بشار عهد في سوريا

Di tevaya aliyên jiyânê de, rola sereke ya hêzên ewlekariyê ye û bêyî erêkirina wan ti kar bi rê ve naçe, evê yekê hişt ku ev hêz û alî serwerên herî çalak ên Sûriyayê bin û hemû çalakiyên aborî, siyasî, çandî û civakî bi wan ve girêdayî bin. ev hêz û alî jî bi ofîsa ewlehiya neteweyî ve girêdayî ne ku ew bi xwe jî rasterast bi ser serokatiya komarê ve ne, ev jî tê wateya ku ew tekane aliyê ku çalakiyên li Sûriyayê çêdibin kontrol dike. Piraniya dezgehên ewlekariyê piştî hatina Be`is li ser hukim sala 1963`an hatin avakirin, û rewşa ewarte di 8`ê adara 1963`an de hat ragihandin.²²

Ev dezgehên mijara gotinê jî yên îstîxbarata leşkerî, ewlehiya siyasî, ewlehiya dewletê û îstîxbarata asmanî ne, her wiha her dezgehek bi dehan şaxên wê hene û xwe dispêrin belavkirina tirs û xofê di nava xelkê de û bikaranîna hemû rê û rêbazên çavdêrî û guhbelkirinê (hishisandin). Akademîsyen "James T. Quillivan" di derbarê dezgehên ewlekariya yên sûrî de wiha dibêje: "Hikûmetê gelek dezgehên ewlekariyê yên hundirîn û xwedî taybetmendî dan avakirin, bi armanca çavdêriya alîgiriya artêşê û hemwextî wê, çavdêrîkirina hevûdin bi rêya rêgehên pêwendiyên serbixwe bi serkirdeyên serdest re".²³ Li devereke din jî dibêje: "Serokê dewletê timî dezgehên îstîxbaratê di nava rewşeke pêşbaz de dihêlan, ew jî da ku ti serkirdeyên wan cihê yê serdest dagîr neke".²⁴

Li aliyekî din di heman çarçoveyê de, nivîskar û semînerdanê di dîrok û siyaseta Rojhilata Navîn de, David W. Leech jî dibêje: " bi sala 2011`an re, ji serê her 240 kesî, yek ji wan endamekî îstîxbaratê ye, her wiha piştgiriya darayî ya dezgehên ewlekariyê- ku derdora 3 milyar dolar e di salê de- bêhtirî sêriba budceya leşkerî ye"²⁵. Îcarê dezgehên îstîxbaratê, hêza parastina rejîmê bûn.

Gendelî

²² [الأجهزة الأمنية ودورها في مفاصل الحياة في سوريا](#)

²³ Navenda Sûrî ya Edalet û Lêpîrsînê, Llcudran Azan, belgeyên veşartî yên dezgehên ewlehiya Sûriyayê ne, 2019, R14

²⁴ Dirûb Dîmeşiq, R 30.

²⁵ David W. Leech, Sûriye, Hilweşîna Padîşahiya Esed, Çapxaneyê Şirketa, Beyrût, çapa yekem, 2014, R 91.

Gendeliya ku di laşê rejîma sûrî de digere, di derketina rewşeke çînîtiyê de xwedî roleke girîng e, çimkî çîneke pîrr dewlemend derkete holê, her wiha hejmara kesên ku ji peywir û erka xwe sûdê dibînin, roj bi roj zêdetir bû, di vê çarçoveyê de, "Kemal Diyab" di pirtûka xwe ya bi navê "Dîroka Sûriyayê" de li ser çawaniya hiştina hêsankirina rejîmê ji bikaranîna nebaş a wan kesan ji peywir û erkên xwe re dibêje: "Hin kes dibînin ku hêsankariya Esed ji wan kesan re mîna diyariyekê ji alîgiriya wan a bi Esed re bû, lê hin jî dibînin ku Esed bi xwe nedikarî rê li ber wan kesên gendel bigire, ji ber ku hejmara wan gelek bû û kesên payebilind di nava wan de hebû, heta asta ku rêgirtina li ber wan dibe ku têkçûna rejîmê bi xwe re bîne".²⁶ Nivîskar û rojnamevanê brîtanî Patrick Seale jî vê gendeliyê rave dike û dibêje: "Pêdiviya rejîmê bi çîneke burjiwazî ya nû li şûna ya kevin, ku şerê wê kirî, hebû. Her wiha ne tenê xwedewlemendkirin, lê belê serkêşan êdî derfet û desthilatên di destên xwe de şaş bi kar anîn û êdî her yekî li gorî xwe qanûn bi rê ve birin û bi cih anîn". Bi vê yekê, sînorên gendeliyê berfirehtir bûn û êdî bû diyardeyeke civakî.

Artêş

Dema ku "Be`is" hat ser hukim, du artêş ava kirin, yek birêkûpêk ku xwe nedisparityê, her wiha artêşeke hevseng ku rejîmê ji bo parastina xwe, xwe disparityê û di bingeha xwe de, xwe disparate pêkhateya elewî.

Sûriya di serdema xwe ya destpêkê de bi darbeyên leşkerî dihat nasîn û rejîmê sedemên li paş van darbeyan baş dizanî, lewra bi armanca ku ev darbe xwe dubar nekin; saziyên leşkerî paşguh kirin û hêzeke hevseng a leşkerî û alîgir di hundirê artêşa fermî de ava kir, erka wê hêzê jî di serî de parastina rejîmê bû, her wekî "Pasarên komarî (Heres Cimhûrî), " Firqeya Çarem" û berê "Seraya El-Dîfa" bi vê yekê fermandarên artêşê bi xwe jî nedikarî yekîneyên xwe kontrol bikin. Di vê derbarê de yek ji fermandarên artêşa sûrî dibêje: "rast e ez fermandarê yekîneyekê bûm, lê sê efserên elewî li ser serê min bûn. Bi awayekî şakilî di bin fermana min de bûn, lê biryar di destê wan de bûn, weke nimûne livandina

²⁶ Kemal Diyab, Dîroka Hemdem a Sûriyayê, Dar El-Nehar, Beyrût, çapa yekem, 2011, R 439.

yekîneya min û bazdana bi wan re. fermana kuştina min di destê wan de bû, û kontrolkirina artêş proseyeke bigirêk bû".²⁷

Li gorî hin amaran, hejmara artêşa sûrî di sala 2011`an de giha 220 hezar leşkerî, lê rejîmê nedikarî xwe bispêre ji bilî 65 leşkerî tenê. Lewra, di şerê li dijî komên opozisyonê yên çekdar, rejîmê pişta xwe bi yekîneyên alîgir û cihê baweriyê qewîn kir.

Stratejiya rejîma sûrî

Li ser asta navdewletî û di serdema sîstema cîhanî ya dubend de, rejîma sûrî siyaseta bêalî meşand, lê ev stratejî bi ser Yekîtiya Sovyetê ve diçû.

Her wiha li ser asta herêmî jî, siyaseta piştgirîkirina "Tevgerên Azadîxwaz" kir û bi awayaekî neyekser piştgirî da komên çekdar ên dewletên cîran, her wekî tevgerên filistînî û derfetek dabû Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) ji bo bikaranîna erdên sûrî û libnanî û hêskirina tevgera wê, birêz Ocalan dibêje: "

Sûriyayê hebûna me weke mîsogeriyê li dijî gefeke pêkan ji aliyê Tirkiyayê ve, didît. Çimkî metirsiyên Sûriyayê yên dîrokî ji cîrana wê ya bakurî jî hebûn, lewra hebûna me, ji hemû aliyan ve, jê re palpişteke bi ewle bû".²⁸

Li nik piştgiriya wan tevgeran, rejîmê hin sloganên neteweyî jî bilind kirin, weke "Berxwedan û Bergirî", ew jî di dema piştgiriya bi "Xeta Berxwedanê" re li Libnan û Filistînê li dijî Îsraîlê. Li milekî din, hevalbendiya bi Hizbullah û rejîma Îranê re ji stûnên bingehîn ên stratejiya sûrî û siyaseta wê ya berevaniyê bûn²⁹, bi vê yekê êdî Sûriya bû xaleke temamker a projeya "Kevana Şî`î".

Li ser asta navxweyî, rejîmê siyaseteke nerm li hember kêmeteweyan meşand, lê bêyî ku kar ji bo çareserkirina pirs û pirsgerêkên wan bike, îcarê kombûna van pirsgerêkan li gel pirsgerêkên civakî, siyasî û aborî hişt

²⁷ Christian Chesnot, Georges Malbrunot, Rêyên Şamê, Şirketa Metbûat a Weşan û belavkirinê, çapa yekem, 2017, Beyrût, R 242.

²⁸ Ebdullah Ocalan, Manîfistoya Şaristaniya Demokratîk, çapa sêyem, 2017, cildê pêncem, R387.

²⁹ Kemal Diyab, R635.

ku alozî di hemû milên jiyânî de encam bidin û bû sedema teqîna rewşa navxwe ya Sûriyayê di sala 2011an.

Lihevanîn

Rejîma Sûrî li gel şerê navxweyî, ji bo pêkanîna siyaseta lihevhatinê kar kir û di sala 2012an de wezaretek bi navê "Wezareta Lihevanîna Niştimanî" ava kir, bi planeke ku li ser esasê operasyona leşkerî bi pêvajoya agirbestê li herêma armanckirî girê bide, û pê re tevaya herêmê kontrol bike û deverên germ bitemirîne.

Di sala 2015`an de, navenda "Himêmîm a Lihevanînê" hat damezirandin, û roleke mezin di vegerandina herêman li jêr destê rejîmê lîst, ew jî piştî ku bêhn li opozisyonê çikand û gelek tektîk li bermaberî vegerandina herêman bi kar anîn, her wekî "ewlehî û aramî li beramberî azadiyan" û dorpêça li ser esasê "ewlehî li beramberî xwarinê" û dabînkirina niştecihan bi "parastina li bermaberî piştgiriye", ku li herêmên weke gundewarê Şamê, Himis û Derayê bi rê ve çûn.

Guhertina Demografîk

Guhertina demografîk ji siyasetên kevne-nû yên ku rejîmê dimeşîne ye, her wiha weke rêbazê hilweşîna deverên opozisyonê û guhertina bingeha gelêrî li wan deveran bi bingeha alîgira rejîma serdest tê dîtin. Mînakê vê yekê jî, projeya "Kembera Erebî" ya ku ji aliyê hikûmeta sûrî ve di sala 1965`an de derket û di sala 1974`an de ji aliyê "Be`is"ê ve hat cîbicîkirin e, armanca wê jî ew bû ku herêmên kurdî bîn valakirin, îcarê kurd hatin koçberkirin û ereb li şûna wan hatin bicihkirin, bi dirêjahiya xeta sînor a bi Tirkiyayê re (dirêjahî 300 km û pehnbûn 15 km), ev proje xwedî gelek armanc bû, her wekî jihevixistina civaka kurdî û mîsogerkirina rêgirtina li ber her tevgereke ku serî li dijî rejîma serdest rake.

Ev siyaseta han di salên aloziya sûrî de jî xwe dubare kir, ku bi agirbestê dest pê dikir, paşê danûstandin û piştî koçberkirina xelkê, wekî çawa li gundewarê Şamê, bi taybet li "Xûtaya Rojhilat" heta bi Idlib û Efrîna

dagîrkirî çêbû, ev hemû jî bi armanca bidûrxistina rageşiyê ji navendê (Şam).

Sedemên neketina rejîmê

Di encama şoreşên "Bihara Erebi" ku ji Tûnisê dest pê kirin û li Misirê belav bûn, tevgerên gelêrî û xwepêşanderan dikarîn serokê herdu welatên navborî ji hukim bixin, evê yekê dilxwaziyek li cem gelên din ên herêmê ava kir û di nav de gelê sûrî, heman rê şopandin.

Lê encama "şoreşa sûrî" ji gel re ne pêşbînkirî bû, çimkî bi milyonan koçber û derbider û penaber, û bi sedhezaran ji kuştî, birîndar û kesên wenda li pey xwe hişt, ev yek li gel mayîna rejîmê di desthilatdariyê de.

Sedemên Navxweyî:

- **Rewşa opozisyonê:** Piştî derketina xwepêşandanên aştiyane li piraniya herêmên Sûriyayê, veqetîn di nava refên artêşê de derket. Tevî ku hejmar destpêkê gelekî sînordar bû jî, lê belê bûn bingehek ji artêşa bi navê "Arêşa Azad" re, sala 2011`an û hin dewletan amadebûna xwe ya piştgiriya ragihand, lê hin sedem hebûn ku ev opozisyon armancên xwe bi cih neyîne, ji wan:
 - Nebûna stratejiyeke biplan a opozisyonê (îdolojî, felsefe, ramanên avaker û bi serdemê re hevdem) û operasyoneke bicihanîna guhertinê, çimkî yê ne xwedî tewrî û planeke zelal be; dê nikaribe bigihe ti encamê.
 - Destwerdana hin aliyên herêmî di xeta şer de, weke Tirkiya, Îran, Qeter, Urdin û hin dewletên kendavê, ku bi vê yekê Sûriya veguherî qadeke heyfhilînê û şerekî herêmî.
 - Derbiderbûn û tarûmarbûna opozisyonê, tevî ku di destpêka xwe de piştgiriyeke navdewletî bi dest xist, li aliyekî din, tevliheviya di nava komên çekdar yên "Artêşa Azad" de ku ne di bin femandariyeke yekgirtî de dixebitî, lewra piştgiriya ku bi dest bixin çilo û çawa be jî, dê ji ber

cudabûna ajendeyên aliyên piştgir; ti xwestek û armanc bi cih neyên.

- Pûtepêdana bi destkeftiyên madî û mûçeyên ku ji aliyê dewletên piştgir ve werdigirtin, vê yekê bandor li çalabûna wan kir.
- Parçebûna opozisyona siyasî, û nebûna serkirdayetiya wê ya naskirî, tevî hebûna bilokên siyasî di qonaxên curbicur de ku îdiaya nûnertiya wan dikin, û ev bû sedema jidestçûna kontrola wê li ser "Artêşa Azad" û avakirina hevrikiya di navbera wan de ji bo wergirtina postan (peywirên paybilind), û di encamê de, şikestinek mezin di navbera opozîsyona li derve û xelkê ku di bin giraniya şer û şert û mercên dijwar de dijin û êşê dikêşin, û peydabûna cudahiyeke di navbera hewcedariyên xelkên hundir û armancên opozisyonê, ku di serî de dixwest xwe wekî nûnerê gel bi cih bike, li şûna ku rola serkirdayetiya rastîn bi dest bixe.³⁰
- Veguherîna bilez a ji tevgereke aştiyane bo yeke çekdar, yek ji sedemên bibinketina opozisyonê bû, her wiha ev yek li rex radîkaliya ku di opozisyonê de serdest bû, lewra li vir, destê rejîmê yê bilind bû.
- Bibinketina di nêzîkbûna ji kêmeteweyan de, çimkî hewldanên tevlîkirina kêmeteweyan di nava opozisyonê de awayê xwe yê bedewkirinê derbas nekir, di vê derbarê de yek ji serkirdeyên opozisyonê dibêje: "Îrroj li xiristiyanekî, du elewiyan û sê durziyan digerin û dibêjin ku nûnerên wan hene"³¹. Lewra - kurt û kurmancî- em bi hêsanî dikarin bibêjin ku êdî ti cudahî di navbera rejîm û opozisyonê de tune ye.
- Derketina "rêxistina DAIŞ"ê û belavbûna wê li Sûriya û Îraqê hişt ku cîhan berê xwe bide şerê vê rêxistinê, çimkî ew weke xetera herî mezin tê dîtin û derketina wê ji rejîmê re destekek bû, û bi rêya wê şerê dijberên xwe dikir, îcarê di

³⁰ [المعارضة السورية ومشكلة القيادة](#)

³¹ David W. Leech, Hilweşîna Padîşahiya Esed, R143.

encamê de, rejîmê ji tevliheviya ku li Sûriyayê hat çêkirin, sûd girt.

Rewşa kurdan:

Kurdên sûrî di avakirina Komara Sûriyayê de bi awayekî çalak beşdar bûn, her wiha di avakirina dewletê de jî xwedî roleke berz bûn, lê li ser destê "Be'is" hatin paşguhkirin, gelek êş kêşan û ji maf û nasnameya sûrî bê par man û hatin tecrîdkirin, ji bîr kirin ku kurd li Sûriyayê ji damezrînerên wê yê hevçax ên herî girîng bûn, ne tenê wîsa, "lê belê rêjeyeke gelek mezin ji kurdan li Sûriyayê heta niha ne hemwelatî ne, anku bi rêya qanûnê nayên naskirin. Ên mayî jî ti mafên wan ên qanûnî, çandî, aborî, birêveberî û siyasî tune ye, bi gotineke din, rewşa kurdan ji ya mîtengeriyê paşmayîtir û xerabtir bû."³²

Di sala 2004'an de kurdan li dijî zilm û zordariya ku rastî wê dihatin, serhildaneke berfireh li dar xist û bû gava yekem a şikandina benda tirsê, lê belê kes bi wan ve venehewiya û bi tena xwe li qadê man, bêyî ku beşên din ên ku zerer ji rejîmê didîtin destekê bide wan, çimkî şovenîzmên ereb li rex rejîmê li dijî kurdan sekinîn.

Sala 2011'an, kurdan xwe ji şerê di navbera desthilat û opozisyonê de bi dûr xistin û parastin û berevanî di ber herêmên xwe de kirin, îcarê Hêzên Parastina Xweser hatin avakirin û li dijî êrîşên DAIŞ`ê berevanî di ber herêmên xwe de kirin û gelek rizgar kirin, di wextekî de ku hikûmeta sûrî bi şerê bi opozisyonê re mijûl bû ku ya dawîn gef li bajarên mezin dixwarin, îcarê rejîmê siyaseta ne-rûbirûbûna kurd û kêmteweyên din meşand. Ji vê yekê zêdetir, hebûna giyanê berxwedêr li cem kurdan di şerê li dijî DAIŞ`ê de û bibinxistina wî, bandor li rejîmê kir ku li ber ketinê bû, vêca li vir, parastina sînorên bakurî rê li ber ketina rejîmê girt.

Rewşa Birêveberiyî

Ji rojên destpêkê yê xwepêşandanên li Sûriyayê di sala 2011an de, rejîmê giringî da karê dezgehên dewletê, û xizmetguzariyên pêşkêşkirî di berjewendiya hikûmeta Şamê de bûn, ku wek nimûne, di dayîna mûçeyên karmendên xwe de, li herêmên li derveyî kontrola xwe, berdewam bû.

³² Ebdullah Ocalan, cildê pêncan, 2018, R187.

Li milekî din û ji sedemên din ên ku hêlan heta niha rejîm hêza xwe li dijî opozisyonê bipolarêze, rewabûna wê di nava civaka navdewetî de, lewra xwe weke nûnera rewa ya dewletê dibîn û çarenûsa xwe pê ve girêdide, her wiha gelek ji peywir û karên dewletê kirin navendî û xizmetên bingehîn li ser parêzgehên Sûriyayê belav kirin, di encamê de bûn navenda hêzê, ha ev bû şaşiya ku opozisyon ketiyê de, ji ber ku wê her texmîn dikir ku rûber girîngtir in, lê di dawiyê de xuya bû ku di rewşa Sûriyayê de, navendiyet ji her tiştî girîngtir e".³³

Sedemên Derveyî:

A- Li ser asta herêmî

- **Îran:** Îran Sûriyayê weke kûrahiyeke stratejîk ji xwe re dibîne, lewra dema tevgera li Sûriyayê veguherî tevgera leşkerî û çekdar, beriya her kesî, Îran bi komik, pisporên xwe yên "Pasarên Şoreşger" di amadebaşiyê de bû, di wextekî de ku Sûriya li ber hilweşînê bû. Evê yekê hişt ku îranî bi awayekî bilez destwerdanê bikin da ku hilneweşe. "pêşdeçûnên aloziya sûrî ji yên şoreşê din ên erebî cudatir bûn. Ev xwepêşandan li ser hevpeymanên heyî xeteriyek e, anku hilweşîna rejîmê dê hilweşîna xeta Teheran-Bexda-Şam-Beyrût bi xwe re bîne"³⁴, çimkî Îran qada sûrî weke aniyekê parastina berjewendiyên xwe û yên rejîma xwe ya mezhebî dibîne, lewra dstwerdan bi rêya hemû aliyên hukim li aloziyê kir û bû mîna hêzeke veşartî ya ku li ber hemû çareseriyên heyî disekine û li hemberî çareseriyekê sûrî bû astengî.
- **Li aliyekî din** tirkiyayê jî destekeke diplomatîk û leşkerî pêşkêşî komikên opozisyonê û yên radîkal kir, û rê da çekdarên tundirew ku sînore wê derbas bikin û ev gav bû destpêka têveçûna Tirkiyayê di dosyaya sûrî de.

Her wiha destwerdana Tirkiyê û kontrolkirina navçeyên bakur ji bo opozîsyonê bû sedema negihîştina çareseriyek ji aloziya Sûriyayê re û ji ber wê jî Tirkiyê ji van deveran dernakeve heta ku negihêje berjewendiyên xwe, ji ber ku ew dever di mijara sepandina mercên xwe

³³ [استراتيجية النظام السوري خلال الانتفاضة](#)

³⁴ Dirûb Dîmeşq, R202.

di dema guncaw de wek kartekê ne. Hembêz kirina Tirkiyê ji opozisyonê re rêya opozisyonê ji rûbirûbûna rejîmê guhert û ji bo parastina ewlehiya neteweyî ya Tirkiyê hat bikaranîn. Opozisyon bi vî awayî ji naveroka xwe hat valakirin. Her çendî Tirkiye îdia kir ku ew li dijî rejîmê şer dike, lê di parastina rejîmê ji hilweşîn de rol lîst.

Di heman çarçoveyê de, Qeter jî rol lîst, dema bilez tevgera li Sûriyayê bi çek kir û vê yekê rewabûnek da şerê rejîmê yê li dijî opozisyonê.

b- Li ser asta navdewetî

- **Rûsya:** Têkiliyên Rûsya û Sûriyayê yên dîrokî û kevnar hene, û Sûriyayê ji bo Rûsya weke xendeqa dawîn li Rojhilata Navîn tê dîtîn, lewra jidestdana vê xendeqê tê wateya jidestdana berjewendiyên xwe yên li Rojhilata Navîn, û ji ber ku Rûsya xwe weke hêzeke bilind a li herêmê dibîne, dît ku li Sûriyayê dikar xwestek û xewnên xwe bi cih bîne, lewra bi destwerdana xwe ya sala 2015`an rê li ber hilweşîna rejîmê girt û di civînên navdewetî û herêmî de ji rejîmê re bû garantor, îcarê Rûsya li gel Çînê heta sala 2019`an jî derdora 14 caran mafê Vetoyê bi kar anî û ev yek bû sedem ku Encûmena Ewlekariya Navdewetî nedikarî proje-biryareke hişk li dijî rejîmê bistîne û pêk bîne.
- **Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Rojava:** Sedema rasterast a destwerdana Amerîka û hêzên rojava li Sûriyayê şerê li dijî DAIŞ`ê bû, evê yekê hişt ku ew alî hev bendiyê li gel hêzeke xwecihî çêbikin, da ku rê li ber terorê bigirin û şerê wê bikin, îcarê aliyên rojavayî nema ji bo hilweşîna rejîmê xebitîn û daxwaza guhertina reftarê wê kir, li vir, êdî ji "hilweşîna rejîmê", giranî bêhtir dan "şerê terorê", vê yek hinase li rejîmê ve gerand û hêz û desthilatiya xwe ji nû ve bi dest xist, lê tevî wê jî, ew aliyên me behsa wan kirî (Amerîka û rojava) hîna jî kaxezên fişara li dijî rejîmê di destên wan de hene û gelek caran di demên hesas de bi kar anîn, her wekî kaxeza "bikaranîna çekê kîmawî" û komkujiyên ku ji aliyê rejîmê ve

hatin kirin (Komkujiya Tendamûnê), û qedexekirina asayîkirina têkiliyan bi rejîmê re, her wiha cîbicîanîna "Qanûna Qeyser" û sepandina gelek cezayan ku hiştin rejîm di nava rewşa berdewamî û hilweşînê de bimîne û di encamê de Sûriya veguherî qadeke şer a di navbera hêzên cuda de û fişarên hewldana parastina rejîmê û fişarên bi armanca guhetina wî bûn hevdem û hiştin ku rejîm bi temamî hilneweşe.

Pirsgirêkên navxweyî ku rejîm rastî wan tê

Tevî ku şerê Sûriyayê heta niha nekariye rejîmê birûxîne, lê ev şer bûye sedema gelek pirsgirêkên mezin, ku rê li ber her çareseriyekê ji aloziya Sûriyayê re girtine. Ne pêkan jî ku rejîm bi tena xwe karîbe rûbirûyî van pirsgirêkan bibe, ku ew jî ev in:

Jinûve-avakirin:

Eger şerê li Sûriyayê bi dawî jî bibe û operasyonên leşkerî rawestin, wê binesaziya jihevketî û hilweşandî weke astengiya herî mezin li pêşiya Şamê bimîne. Eger em bîna behsa beşê enerjîyê bikin –weke mînak- em dê bibînin ku 70% ji stasyonên kehrebeyê û xetên gihandina sotemeniyê ji hev ketin û ne di xizmetê de ne, ev bi tena serê xwe dikare beşên din ên jiyânî ku girêdayî enerjîyê ne rawestîne, li gorî pêşbîniyên raportên Neteweyên Yekbûyî, lêçûna jinûve-avakirina Sûriyayê digihe 400 milyar dolarî, ev ji bilî vegerandina 12 milyar koçber û penaber bo herêman wan.

Îcarê pîrsa ku xwe dide der ew e, gelo kî dê bi jinûve-avakirinê rabe? Dewletên piştgiriya rejîmê dikin bi xwe di bin zora cezayên navdewetî de mane, her wiha hin dewletan jî mijara jinûve-avakirinê bi çareseriyaya siyasî ve girêdane, ji wê zêdetir, weberhêner ne amade ne ku destwerdanê bikin di wextekî de ku "Qanûna Qeyser" li dar e, lewra em dibînin ku meseleya jinûve-avakirinê di halê hazir de ne pêkan e ku bi cih were.

Qanûna Qeyser

Qanûna Qeyser a Amerîkî di qonaxa ya xwe yekem de, di 14`ê hezîrana 2020`an hat cîbicîanîn, ew jî bi armanca sepandina tecrîdeke darayî,

aborî û siyasî li ser serokê Sûriyayê Beşar Esed û hevalbendên wî, da ku wan neçarî çareseriyê siyasî ji aloziya Sûriyayê re li esasê biryara Encûmena ewlekariyê 2254 bike. Di nava vê qanûnê de her wiha sepandina cezayan li dijî çî aliyê ku piştgiriya darayî û teknîkî pêşkêşî hikûmeta sûrî bike jî heye, di nav de dewlet û bi taybet Rûsya, Îran û Libnan, anku bi kurtasî em dikarin bibêjin ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dê çî dewleteke ku beşdarî şerekî navxweyî di dewleteke sêyem de bibe, ceza bike.

Aloziya Koçberan

Alzoiya sûrî derbasî sala xwe ya 11`an bû, û hîna jî nêzî 6.7 milyon kes penaber in di hundirê Sûriyayê de û 5.6 milyon kes koçber in, bi vê yekê derdora ribek ji koçberên li tevaya cîhanê sûrî ne û êdî ev koçber yek ji alozî û astengiyên herî mezin in li cîhanê, her wiha bargiraniyêke din a li ser milê rejîmê ye û di encamê de vekirina deriyekî ji çareseriyê aloziyê re hatiye taloqekirin.

Çi li hêviya Sûriyayê ye?

Halê hazir di vê rewşa bigirêk û tevlihev de, zehmet e paşeroja Sûriyayê bê pêşbînîkirin, çimkî berjewendiyên navdewetî, herêmî û navxweyî tevlihev bûne û bûne mîna girêkeke kor.

Li ser asta leşkerî, em dikarin bibêjin ku meydana Sûriyayê ji sala 2020an ve tûşî operasyonên leşkerî yên mezin nebûye, û tevî şerên demkî û dembidem di navbera aliyên şerê de, lê eniyên pêşîn û sereke di rewşêke cemidî û bêşer de ne.

Sûriya îrroj dabeşî sê herêmên hegemon û xwedî desthilat bûye, ev herêm jî di bin destê hêzên herêmî ku bi awayekî nerasterast piştgiriya ji aliyên navdewletî yên bihêz werdigerin, de ne.

Dêmek, gelek hêzên leşkerî û baregehên biyanî li herêmên navborî peyda dibin, îcarê çî destwerdaneke leşkerî ji bo piştgiriya çî aliyekî li ser erdê dê temenê şerê li Sûriyayê dirêjtir bike û ne dûr e ku berdewamiya tundirewiyê û şer, jinûve-vegera komên terorîst bi xwe re bîne, çimkî her herêmeke xwedî desthilat ji herêmên me behsa wan kirî berjewendiyên

wê dijberî berjewendiyên aliyên din in û ev yek rewşa sûrî aloztir dike. Li vir û di vê rewşa binakok de, pirsek tê bala mirov, gelo çarenûsa van herêman di paşerojê de çi ye?

Li gorî rewşa li ser erdê û hin daneyan, êdî çareserî hîna ne zelal in, her wiha armancên aliyên çalak li Sûriyayê nepenî ne, ji ber vê yekê, hîna sedemên şer li dar in. meseleyeke din a balkêş heye ew jî ew ku tevyaya hêzên ku li van herêman dimînin desthilata hevûdin nas dikin û danpêdanekê nefermî bi rengekî ji rengan bi hev dikin.

Di dawiyê de, em dikarin bibêjin ku rewşa dabeşiyê Sûriyayê ne dûrî ya Îraqê ye, pêkan e ku çarenûsa herdu dewletan çêbûna dewleteke nû di hundirê wan de be, di vê derbarê de rojnamevanê îtalî Yaroslav Trofimov dibêje: "Li ser erdê, êdî Sûriya û Îraq nema mîna du dewletan tên hesibandin, çimkî gelek xaka wan ji destê hikûmeta navendî derketine û ji ber destseriya mezheb û nijadî êdî Sûriya û Îraq ji wateya dewletbûnê hatine valakirin.. di vê kaosa ku li dora qerika Rojhilata Navîn hatiye pêçan de, diyar e ku dewletên ku beriya sedsalî encamê mêtîngeriya ewropîyan bûn, ew niha bêhtir tên hilweşandin".³⁵

Lê ji îhtîmalên ku gelek kes nîqaş dikin e, pêkanîna rejîmê ji hin çeksazî û sererastkirinan re, her wekî guhertina destûrê yan sererastkirina wê. Lê rejîmên bi vî awayî ti carî çaksazkirin û sererastkirinê qebûl nakin, çimkî sistkirina rejîmê tê wateya hilweşîna wê, û rejîma sûrî vê rastiye baş dizane.

³⁵ [هل ستعني حدود جديدة صراعا أقل في الشرق الأوسط؟](#)